# Sema Kurd

Dezgeha Rewşenbîrî û Hunerî

کوردی | عربي | Kurdî | English

.:: November 23, 2006 ::.


rojên wêjeyê li Amedê li jêr dirûşma "Ji bo cîhaneke bi aştî wêje"

nûçe
gotar
hevpeyvîn
çalakiyên sema
helbest
Beşê zarokan


nûçe Back

## Di rojên wêje yê de li Amedê Konferansek li Zimanê Kurdî Hat li darxistin û Helbestvanê mezin Abdullah Peşêw pirtûkên xwe îmze kirin

[08:25 , 21 Nov 2006]



Konferansa Zimanê Kurdî dest pê kir
Konferansa Parastina Zimanê Kurdî û Perwerdehiya Kurdî' bi beşdarbûna 150 rewşenbîrên ji Tirkiye û welatên derve hatîn, dest pê kir. Di konferansa dê 4 komên xebatê tê de bên avakirin de, mijarên wekî pêşvebirina ziman, parastin û perwerdehiya ziman bên nîqaşkirin.

Konferansa Parastina Zimanê Kurdî û Perwerdehiya Kurdî ku di çarçoveya 4'emîn Rojên Wêjeyê ya Amedê de tê lidarxistin, li Salona Konferansê ya Şaredariya Baglara Amedê, dest pê kir. Zêdeyî 150 reşenbîrên ji Tirkiye û welatên wekî Îran, Iraq, Sûriye û Ewropayê hatîne beşdarî konferansê bûn. Mehmet Uzun ku dê axaftina destpêkê ya konferansê kiriba, ji ber nexweşiya xwe nekarî beşdarî konferansê bibe û li ser eşkerekirna vê yekê di konferansê de ji bo Uzun çepik hatin lêxistin. Ji ber beşdarnebûna Uzun, Serokê Kurdî-Der'ê Abdurrahman Bakir axaftina vekirinê kir û der barê xebatên komeleyê de agahî dan. Bakir wiha axivî:

"Heta niha me ji bo parastin û pêşvebirina ziman xebatên girîng kirin. Di serî de bajarên herêmê li gelek bajarênTirkiyeyê jî me komeleyên parastina ziman ava kirin. Bi riya van komeleyan ji bo kesên dixwazin perwerdehiya taybet tê dayîn. Mamosteyên bikaribin ziman hîn bikin tên gihandin û xizmeta ziman tê dayîn."

'Li ser zimanê kurdî tahrîbatên mezin hatin kirin'

Bi armanca nirxandina konferansê Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr jî axaftinek kir û ji bo eleqeya kesên beşdar û


Wşanên Sema



Ji weşanên Dezgeha Sema 6 Pirtûk

Pirtûkên nû



Çapa duyêmîn Ji koma çirokên- Balûlka Şekirê-ya çirokên nivîskar Hesen Silêvanî Derket

Bîstikek Guneh çaxê Ku Havîn Hîna Terbû Berhma nû ya helbestvan Kemal Necim

Sibe Ewê Bê Dîwana Hadî Behlewî



Rêklam






Festîvala Duhok 2



NEW

Festîvala Duhokê 2 Dîtin û Pêşinyarîyê Nivîskara li gel wêneyên Festîvalê



Dara Sawêrên Tî Dîwana Hoşeng Osê

Zindana Biçûk -Ezîz Xemcivîn

Bavê Serbest (Nêrgiz)

Pirtûkxana kurdî

Pirtûk PDF

Lêkolîn



new

Hunera helbestê careke din - 4 - Awaz û ritma helbestê..Nivîs : Heyder Omer

Hunera helbestê careke din - 3 -Wêneyê helbestî ..Nivîs : Heyder Omer

Hunera helbestê careke din* - 2 - Alavên derbirina hunerî ...Nivîs : Heyder Omer

Hunera helbestê,careke din* - 1 - Helbest di navbera îlhamê û cefa de ...Nivîs : Heyder Omer


Şano



new

şano ...TOFAN... Nivîs : Mizgîn mele

Navdarên kurd



new

Bi bîranîna Seydayê mezin Cegerxwînê nemir ...Nivîs .. Dr.Ebdilmecît Şêxo

Jiyana Yilmaz Günî

Jiyana Melayê Cizîrî

Jinenîgariya Feqiyê Teyran (1590-1660)

Helbest

Kîme Ez ?- Helbest - Cegerxwîn

Bêrîya Botan - Helbest - Celadet Bedirxan

xizmetên wan ên ji bo ziman spasiya xwe pêşkêş kir. Baydemîr, balkişand ser tahrîbatên li ser zimanê kurdî û wiha pêde çû: "Îro li Rojhilata Navîn hêj li ser ziman û wêjeyê zordarî heye. Kurdî li dijî erebî û tirkî nîn in. Divê ev baş bê dîtin û ev nêrîn bê guhertin. Hêvîdarim ku konferans bibe wesîleya parastina ziman a li Rojhilata Navîn. Her zimanek di hundirê xwe de dewelemindiyekê diparêze. Ku mirovek bixwaze tama çandekê hilde, divê zimanê wê çandê bizanibe û lêkolînê li ser bike. Min bi xwe tu perwerdehiya kurdî nedît û mamosteya min dayîka min e. Êdî divê em vê peywirê ji wan bigirin û em bikin."

Polîs ketin konferansê

Konferansa ku dê piştî axaftina destpêkê ji çapemeniye re girtî dom bikira, li ser pêkûtiya polîsan ji çapemeniyê re jî hate vekirin. Polîsên ji dadgehê destûra şopandina konferansê stendin, destnîşan kirin ku dê heta dawiya konferansê bi qamerayê çalakiyan bikişînin. Li ser vê yekê di navbera polîs û beşdaran de nîqaş çêbû.

Di konferansa dê tê de 4 komên xebatê bên avakirin de, mijarên wekî pêşvebirina ziman û hişmendiya parastina ziman, mafê perwerdehiyê, materyalên perwerdehiyê, teknolojî û zimanê kurdî, li Suriyeyê rewşa kurdî, li Ewropayê têkoşînên sivîl ên ji bo ziman hatine meşandin û gelek mijarên din dê bên nîqaşkirin.

Presskurd

**************************

Helbestvanê bi nav û deng Abdullah Peşêw bi hezkerênhunerê yên Amedê re hate kombû û destnîşan kir ku ew bi xwendina helbestên xwe yên ji bo bedenên Amedê pir keyfxweşe.
Li gorî malpera Preskurd nivîskarê helbesta Birakujiyê Abdullah Peşêw bi guhariyek helbesta ya di çarçoveya 4'emîn Rojên Wêjeyê ya Amedê de bi hunerhezên Amedê re hate cem hev, eleqeyek mezin dît. Peşêw gelek helbestên xwe yên wekî Name, Aştî, Sedsal, Rojbaş, Leşkerê Winda ji guhdaran re pêşkêş kir.
Peşêw di navbera helbestên xwe de têkildarî mijarên di helbestên wî de derbas dibe de jî agahî dan û anî ziman ku ew bi xwendina helbestên xwe ya ji bo bedenên Amedê re pir keşfxweş e. Di guhdariya helbestan a hind nameyên Peşêw ên wergerî tirkî hatîn kirin, hatin xwendin de, Şaredarê Bajarê Mezin Osman Baydemîr destegulek da Peşêw.
Piştî guhdariyê Peşêw ji hêla guhdaran ve bi deqeyan li ser piyan bi çepikan hate pêşwazîkirin û piştre Peşêw pirtûkên xwe ji xwendevanên xwe re îmze kir.

Print Send by E-mail Back




new

Navenda Efrîn ya Aferîn û Çanda Kurdî Pişbirkek helbestî ragihand

Berhemên Hunerî



Du berhemên Hunerî bi alîkarîya Dezgeha Sema Tomar bûn û belav bûn - Eyşo ( Rêber Wehîd) û - Nervîn ( Sefqan orkêş)

Alboma wêneyan

Wêneyên bajarên kurdistanê

Nexşeyên kurdistanê

Şêwekarî-gallêrî






jîyan û tabloyên Hunermendê şêwekar Mîrê Hêka

Tabloyeê Hunermendê Şêwekar welîd Al-huseynî

Hunermendê kurd Arsevin Mikail - jîyana wî û çend tabloyên wî

Karîkatêr



Karîkatêr